# NARÎN OMER SEYFEDÎN

# ÇAVÊN DIL

## Helbest

Navê pirtûkê:

**Çavên Dil "helbestên rêzbend"**

Navê nivîskar:

**Narîn Omer Seyfedîn**

Wêneyê Qapê:

**Şêrîn Elî**

Amadekirina Qapê:

**Sebrî Resûl**

Lêveger û hûrbîniya Ziman:

**Merwan Berekat**

Ev pirtûk ji weşanên:

**Yekîtiya giştî a nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriya ye**

# Şîrava evînî û dilsoziyê

Ji giyanê Perîxana dilsoz re

Ji nêrgizên jiyana min

Dastan, Sazîn, Şêrîn, Şanya û Aryam re

Ji heval û dostên canxweş re

Ji hemî hezkiriyên peyv û ramanên min re.

# Qelem

Qelem geş bû bi pirtûkê
hizir xwendin çira rokê
Bi dastan û bi halbestan
dirêsin bo me dîrokê
Mejî hevbend e bo nestan
bixwînin razeyên rokê
Zemîn û xak sitêrkên geş
nehênên ax u nahokê
Heya kû em sirûşta can
tekez kin pêre çîrokê
Xwe bavêjin hemêza germ
bi mûzîka zimanokê
Bila neqşên hunerbazan
diyar kin jê re bîrokê
Jiyana geş tê parastin
hizir rahêşte pirtûkê

# Xewna Şêx

Ez im şêxê te Senanî
ew ê xewnê qeder danî
Keça Ermen bi dest bînim
berazan baş biçêrînim
Kumê oldariyê rakim
bi dengê zengilî bakim
Li ba Ermen bijîm herdem
vexwim mestê nema zemem
Bibim dîlê evîna dil
bijîm d'qesran de yan kavil
Mirîdîno nekin loman
nerêsin bendik û kovan
Xwezî xewnên herî dijwar
nebin para kesên jîndar
Ji ber kû wan dixapînin
xewa çavan vedimrînin
Keşa dêrê dibînêt aş

Mela zikran dixwînêt şaş
Xemên dînok dikin suhbet
civatên xweş dibin hizret
Mirovan dûr dikin yekser
heval û dost dibin rêber
Tenê ew dilrevîn û yar
semadarê dilê hestyar
Ji bo hizran dibî şahyar
ji ramanan re ew hevkar

Wiha bû ew evîna zor
gava hildam li jêr û jor
Dema ew za fena kanî
dilê bêhiş peyal danî
Wekî şêxê me Senanî
evîna dil bi min anî

# Welatê Eşqê

Kenê çavan kenê lêvan
nerînên dil dibin mêvan
Pevokên geş bi wan xweş tên
demarên wate bûn rêvan
Ne poşman im ji vê Eşqê
sipasdar im ji van lêvan
Hemî peyvên te xweş tamin
wekî hinguv wekî sêvan

Li ser ritma dilê mestyar
niyaz xweş bûn li gel lavan
Sirûşta reng bi demsalan
dibin bînahiya çavan
Di seyrana giyanê pak
didavêjim bi lez gavan
Em in rengê bihara dil
hunermend im tu helbestvan

Welato her dimînî xweş
tu rêzan î ez im rêwan
Siha daran hemî çaxan
li daristan li nav mêwan
Hemêz û sîng du paytext in
nikarim ez bijîm bê wan
Bimînî war ji bo kurdan
tu yî sîber tu yî sêwan

# Çemê Dicla

Tu her çaxan newavîn î
meqamên rengereng tînî
Silavên xweş ji kû hatin
bi çavên geş dimeyzînî
Silavên Dêrika Hemko
kulîlk in jê re rengîn î
Meya Indîwerê kef da
Peyalên zer dineqşînî
xeyalên dil semadar in
tu temtêl î tu raxwîn î
Buhar zû tê li canê min
erê çawa dinerxînî
Pira Bafid resen text î
bi bircan her tu dengîn î
Kevanên kevneşop rewş in
dibî rêzdar û navîn î
Ciwan û kal buharvan in

ji bo dîtna te xwezgînî
Ji Xeydayê vexwim avê
bi min xweş tête avînî
Eger çavên te bê coş bin
tu yê Xeyda bi xeydînî
Bijî Dicla çemê jînê
tu alav î tu nûjîn î
Kenê pêlên te dijwar hat
kela giryê min dertînî
Tu jî wek min evîndar î
bi awazên xwe zengîn î
Dibêjî min temenxort im
ez im Mem can tu yî Zîn î
Bi van peyvan dibim Basûr
diçin tev jan û xemgînî

# Sûnda Bêcan

Hezar sûndan didim her car
te bavêjim ji bîrokê
Hemî şopên te winda kim
ji mêjoyê ji dîrokê
Mixabin sûnd u peymanêm
dibin mîna gulîstokê
Bi dîdara te ya aram
li pêşber min mîna rokê
Ji kêfê çav dilîlînin
sirûda xweş ji pirtûkê
Tuyî peyva herî navdar
ji helbestê ji çîrokê
Tuyî ritma resen bingeh
ji mûzîka biharokê
Bihîstokên te xweş deng in
tuyî canê bihîstokê

Emêl û name şîrav in

li nav tayên hemaylokê

Nema sûndan dipeyvînim

em in daxin ji arokê

Bi mayîna te paydar im

dibînim rastiya lokê

# Leyla Qasim

Delala dil ser rûk hilda
gula jînê bi lez gulda
Daristanê çiqil der kir
dara azadiyê pel da
Derzîdanka kulîka dil
ayîna dil ji dil, dil da
Çavê rizgariyê bel bû
gava cana me çav kil da
Dema wê bilbila canxweş
peyama aştiyê hilda
Ez im Leyla keçka Qasim
ji dil min bersiva gel da
Avrêja hiş xunav werkir
kêşa serkeftinê hilda
Înana kurd bi coş gur bû
navbirka aştiyê kel da
Zerya kurdan bi şehnazî

payabûna xwe zengil da

Dozê deng da bi wê Alê

axa kurdan çi simbil da

Leyla Qasim lehinga pak

dîrokê bo te rûpel da

# Piçûkanî

Di ber mala te ez borîm
kela mêhla te xweş barî
Hişê min wax li hevdû ket
bi nalînî bi axdarî
Dilê min axivî bê deng
bi sed zarav û çend zarî
Li ber çavan hizir pir bûn
mijangên rû ne haydarî
Piçûkanî xwe nîşan da
li dîrokê be guhdarî
Pijîjkên hiş li hev anîn
şevîn û roj bi yekcarî
Çemê avboş silav xwendin
mirada dar e sîdarî
Evînî pêre serxweş bû
bila barke sitemkarî

Dema borî ji destan çû
nema êdî buharşar î
Jiyana xweş wisa firda
ne parastin ne guhdarî
Mixabin min xwe winda kir
tu jî wek min gunehbar î

# Xelata Kawa

Buhar tê pêre tê Avdar
semadar in kulîlk û dar
Gelê kurdan bi şêranî
dixemlînin dilê mestyar
Li benda wê mirad xweş tên
mirada em kirin navdar
Bi karê wî lehingê jîr
xetîrên agirî wek ar
Hesinkarê xwedî halan
bi halanî dikir hawar
Erê kurdno bi şehyanî
em ê çêkin welat û war
Ve roja nû helat û hat
bi Newrozê me kuşt zordar
Wiha kawa gelê bindest
ji xewna reş kirin hişyar

Hezar caran em ê bêjin

bijî Newroz mebesta zar

Erê kawa lehingê merd

dimînî karkerê şahyar

# Şeva Serserî

Şevek pir serserî gur bû
bi tolazî bi min şerda
Nexweş bûm ez ne saxlem bûm
tenê mabûm bi wan derda
Guhê rastê zumezum kir
mijangên çav ketin serda
Ji nişkanî ve rîng rîng hat
telîfonê zumên berda
Elo baş im tu her sax bî
bi vî hawî xeber der da
Ez im dilcan tu çawan î
te ez hîştim fena nerda
Nemînim ez tu ahkêş bî
bila bimrim wekî merda
Bi wî dengî keser revyan

giyanê min kirî firda

Ketim baxê evîndaran

gulan rengê sipîzer da

Siyamend û Xecê hatin

di gel şeyda bi comerda

Cegerxwîn bang dikir Kehlê

keça Xalê xweşî virda

Helîm canê tenûr dada

Emîn ê can xwe l'himber da

Elo şêxaniyê vîndar

li Fatim xweş silav berda

Memê Zînê bi ken borî

Sitî awir li tac werda

Feqê teyran bi nalînî

firandin teyrikên Erda

Hunermend Mehmedê Şêxo

diyar kir rastiya kurda

Mirada Memedê Axê

dilek vîndar û perwer da

Bi xêr tê Gulbihara xan

evîna dil bi lez gur da

Reûf Dildar Sirûd saz kir

ji bo Qazî huner berda

Eyaz û Erdewan hatin

xema Tehsîn hema firda

Perîxana xuha dilsoz

mebesta min bi hevber da

Telîfona te basûr bû

bi dengê dil re enber da

# Zimanê Kurdî

Zimanê kurdî
zelal û merd î
Bi zaravên xweş
vedana derd î

Hevalê rok î
zemîn û gok î
Resen temtêl î
Çira dîrok î
Hişî hem mest î
cinav û hest î
Ji bona kurdan
dilê helbest î

Gulav û bihn î
xunava jîn î

Kulîlkên rengîn
ji bo wan t'xwîn î

Sirûda rind î
li şar û gund î
Tu asîman î
hebûna erd î

kila mandayî
pira xwenda yî
Xwecih dîrok î
Fena findan î

Em in şagirt in
lehigên merd in
Tu caran doza
te em naberdin

Dimînî zindî

hebûna kurdî

Vejîna kurdan

dixwînin çendî

# Avzêma Aferîn

Hinav westaye vê gavê
ji tîrêjên xewa tavê
Ji çavdêrên qelaş û beş
gemaran berdidin avê
Divê ew bête parastin
ji taswasê ji aravê
Bi nûzayên sirûşta pak
fena nêrgiz bi lavlavê
Bi wê axaftina canbaz
piyamek geş xwe da navê
Eger kêfê bixwazî tu
li şûnza wê bi yek gavê
Li raser Aferîn xweştê
pesendkirna siha tavê
Bi avzêma dînê wê her
geş in guldar bi şîravê

Bi zeytûnan xemildar tê

diçînên jê re cînavê

# Çavên Dil

Bi çavên min te nabînin
bi lêvên min te naxwînin
Di dermafên te şaşyar in
xwe yekcarê dixapînin

Nikarim bê te jîndarbim
tenê rûnim tenê rabim
Tuyî mayîn tu jîna min
ji ber mana te vîndar bim

Li gor dana te bêzar im
li ber pesnên te bêzar im
Ziman û ev qelem jar bûn
li şûna wan gelek jar im

Ji xwîna min re raşîn î
ji ramanan re hişbîn î

Bilûra van xemên bêdeng

ji kêfa min re pelşîn î

# Henasên Kobanî

Henasên gulperî şîn bûn
bi ava sor re axoşîn
Vejotin tev mirovên war
hemî canîwerên xemgîn
Werin axoş bikin jînê
yekîtî bû vejîna jîn
Li kobanî me baş zanî
biratî xweş xelat û hîn
Bi parastin bi Pêşmerga
hemî hêzên dilêr û dîn
Me serkeftin bi dest anî
nema êdî gemar û kîn
Vehûnadin hezar dastan
bi helbestan vedabûn vîn
Çirûska serfirazî bû
ji Kobanî xelat kir xwîn

Gelê şadman bi vêna dil

himêz kir ew giyanê şîn

# Pêlên Dilovan

Derya ye pir heşînreng e
folqan e zîz e zordeng e
Wek baz e zêde hêzdar e
çavsor e pêre tundçeng e
Xwînmêj e wek sitemkar e
dilpak e ew ferehsîng e

Şahê nenas dixapîne
mîr û began diherfîn e
Jana dilan binalîn e
baxê gulan dişewtîne
Xwîna mejî diforîne
dara zuha dixemlîne

Em bûn tinaz ji avê re
gava me can sipart jê re
Pêlên bilind hemî têkde

dergeh vedan ji mirnê re
Ken û girî bi hevdû re
xwendin hezar niyaz jê re
Ava mezin gelek merd e
destê mişixtan neberde
Xewna dilan dişopîne
j'dana jînê re pir merd e

Ava mezin dilovan e
wêran dike dilê derd e

# Qedera Rojava

Qeder har bû li rojava
felek rabû bi sed gava
Gelê blindest bikin cengê
em in mîna tilî û çava

Milet rabû bi yek carî
serî hilda ji xemsarî
Mixabin ew nebaş hest bû
sipartin bo sitemkarî

Dihat girtin dihat kuştin
biyanî bû hemî mişt in
Penaber bûn li dinyayê
ji xak û war ewan şuştin

Hinek rabûn gelek baş bûn
xwepêşandan bi kar anîn

Bi armancan serî hildan
jiyana xweş bi vên û vîn

Kesin noq bûn gera jîn î
qevaztin ew çemê xwînê
Newêrek bû lehing û jîr
qelaş bû dadgerê vînê

Wiha çêbû li rojava
qeder bû wek devê davan

Gelê cîhan xwe razandin
felaket bû xewa çavan

# Feleknas

Du dil şîn bûn ji gerdûnê
heyîn dabûn dilê jînê
Ji xaka şahiyê der bûn
vedeng in ew ji geşbînê
tivîrkên rastiya aram
feleknas in bi hişbînê
Yekem dil ew dilê min bû
duyem vedşêre gozmînê
Me ev herdu dilê jîndar
bi merdî dane Efrînê
Fedîkok maye pîrbînî
dema xortaniyê d'bînî
Siwarbazên me zeytûn bûn
perîka dil vedikşînê

# Jidilbûn

Lihevdana zivistanê
jidilbûna me dahênan
Cinav û hiş li hev geryan
şiyana awiran deynan
Hem ahenga dilê çavan
bi çavnêrî silav lê dan
Bi hevbazî lavelav bûn
hemî gengaziyên pêman
Nevîn revya li jor û jêr
nebad barkir ji van erdan
Rayên kimkî guhok xwendin
metalên gewre deng berdan
Çi hêmanên regezxurt in
hemanên havilên merdan
Xweristîna hebûna min
Dişewtînin devê derdan
Lihevdanê giyan xweş kir

evînî bo me da radan
Zivorka nûjenî der kir
mebestên wateyan bang dan
Peravên geş sirûdxweş bûn
dema vîna me nîşan dan
Delîvên rêgehan nû bûn
pilandarêj tîne dadan

# Berf

Berfa sipî xweş dibare
xak û zemîn zarezar e
Bahoz sirûdan dixwîne
bayê giran jê re jar e
Zarok mezin lîstevan in
dest û tilî baş diare
Hizra dilan pir heşîn e
serma hebî zur xedar e

Doşav bi berfê re têr e
şêraniyê tîne jêr e
Devê reben gazegaz e
lê çav bi xurtî diçêre
Bûka delal payedar e
dîlan mezin bûne pêre
Rengê sirûştê bi xeml e
roja sipî xêr e, bêr e

Agir bi arê xwe har e
hêlma xweber jê dibare
Rakêşera ar bi nirx e
hogir xumal e bizar e
Çîrok xweş in şev dirêj e
mamik li pey wê siwar e

Xewna dirêj rengvedan e
pejrandina can li dar e

# Jin Jiyan e

Hebûna zindiyan şîn da
heber cot bû ji nûbaran
Giyan hest û mejî mişt in
bi yekbûna du jîndaran
Bi rastî bû jiyana wan
heber xwendin heyîndaran

Ji nêr û mê regez pir bûn
ji pirbûna vejîndaran

Dibêjin jin ji jînê tê
kulîlkên can bi wê şîn in
Penageh tê hemî çaxan
geya û gul jê re bînin
Pevok û wateyên nûbar
xemildar in bi neqşîn in
Ji malbatê re sêwan in
himêz germ in berêşîn in

Bi mêr û jin mirov xurt in
zemîna berfireh girtin
Li asîman xwe şopandin
bi hêz in daner in sert in
Ciyawaz in ji jîndaran
hemî hêlan de serkeftin
Civak zengîn e herçaxan
ew in geşbîn bi rêzgirtin

# Ramanên Ciyawaz

Eger Raman ciyawaz bin
bi hestan ez dilovan im
Nerînên min ne wek hev bin
bi hizran pir dîrokvan im
Guman nêtar bi partî bim
sivîl bim her girancan im
Çi partî min diparêzin
di gemya wan de darvan im
Egr çaksaziyê jîr bim
wekî hev bim xwedî şan im
Siyem caran Yekîtî bim
li rêka Pêşvero danim
Du Azadî du çep cêwî
du rêkeftin bi wan zanim
Demoqratî yekîtî bim
Şepêla pêşerojan im
Du alpartî du partî kurd

ne partî bim ne poşman im
Li dawî ez gelê kurd im
bi dîroka xwe perwan im
Berê şîn im buharvan im
serîgerm im vexwarjan im
Hemî hêlan dipîvim ez
hemî xapê neyar zanim
Xwepêşandan bi kar tînim
ez im ardû me aran im
Dibim cengawerê candû
piyamnêr im perîxan im
Perêsdar im netewbend im
evîndar im rewavan im
Gelê kurd im qiraxmerd im
buhar im zêde lerzan im

# Yadê

Resen peyva herî navdar
hebûna wê ji çar tîpan
Bilindbûna giyanê wê
wekî Xabûr fena Sîpan
Yekem peyva gelê cîhan
serok û serwera peyvan
Elenda wateyên lerzok
gelawêja dilê heyvan
Gelek pîroz e navê wê
kewara bêjeyên sazman
Bi mayîna te dilşad im
dimînim hinde şadîman
Erê Yadê tu mayîn î
erê dayê tu yî semyan
Tu navoka zemînê yî
ji malbatê re bî sêwan
Diyê ronî dikî çavan

bi min asê dikî gavan
Giyanê min diparêzî
bi daxwazan bi sed lavan
Dimîn im ez biçûkê naz
di himbêza buhiştîvan

# Yabo

Silavên geş dixemlînim
ji dara xwestekan tînim
Bi vên û vîn diparêzim
li ser sînga te radzînim
Tu yî avahiya malan
biçûk û jin evînşîn in
Civat û şevbiwêrk têr in
mirov û dost feraşîn in
Tu yî bavê me yê hêzdar
bi wê hêza te bengîn im
Bi şîrava giyanê naz
mirada dil bi cih tînim
Hezar caran dibêm yabo
rewal û zîpelawîn im
Dilovanê xwedî halan
bi halana te geşbîn im

# Rewşen Bedirxan

Jiyanê ew xelata pak
diyarî kir li cîhanê
Di wê rojê de dil şa bû
bi zayînê bi wê danê
Dema Rewşen Bedirxan hat
evînî bû şûna janê
Kevokên aştiyê gur bûn
weşandin bo me nîşanê
Keça mîran keça zana
bi biryarê bi peymanê
Riya azadiyê wergirt
kiras pêça li xiftanê
Eger jin jîr u zanyar bin
çira geştê dibistanê
Li mafan pir zimanzan bin
bi agahî bi guhdanê
Bi çengên rastiya Kurdan
binasin zêde firdanê
Civakê pêre hişdar bin
mifa geş bê li meydanê
Silav Rewşen li wî canî
lehinga ram u xwendanê

Bijî navê te yê pîroz
di bîrokê de ey canê

# Erê Kurdo

Erê kurdo perîşano
leyîstoka êrîşano
li cengê rêberê çeknas
lehingo rasetnîşano
Li ser xaka riyalîzmê
belengazo perîşano
Xwedî xaka herî zengîn
hejaro bê welat mayo
Zemîntêro zevîrengo
diçêrî papiko kayo
Resen binyad dimînî her
rebenyaro xwedê dayo

Evîndarê gelan î tim
ji bo wan zêde pirbêjo
Xinizyarê welêt û war
di dermafên xwe dîngêjo

Milet zanyariyê d'çînin

di xewnên reş de t'rawêjo

# Amojgeha Lavan

Ne şêx im ez ne metran im
ne derwêş im ne betran im
Ne tal im ez ne şêrîn im
ne şor im na ne getran im
Ne hêzdar û sivikhêz im
ne maldar û ne zîvar im
Kulîlkan pir dixemlînim
çira roj im ne êvar im
Serîgerm im ji gerdûnê
ez im dilgerm evîncan im
Li ser xaka evîna dil
sirûş im ez piyamzan im

Tivîrk im bo evîndaran
hunermend im sirûdbêj im
Hemî derdên giranbaran
bi bayê reş re davêjim

Erê dostno evîndar im

mişextê landika can im

Dibim amojgeha lavan

mebest im ez dilovan im

# Xelatên Pîroz

Jiyanê çend xelatên şox
bi dara dil ve alandin
Hemî navên herî pirxweş
cinav û hiş bi lez şandin
Ji wan navan sisê bes bûn
li ser sînga min wan çandin

Xelatên min sisê keç bûn
jiyangêra temen xwendin
Bi wan ez pir vejîndar im
lewind in ew hevalbend in
Giyan in bo gulîstanan
Piyamnêrên hunermend in

Çiqildara yekem geş bû
semadar bû kenê hestan
Ji çîroka Mela Xanî

me xweşnav pêre dahênan
Ev a rind û gelek nazik
vehûnadin jê re Dastan

Berê min baş jiyan nas kir
peyal dagirt ji saza jîn
Ciyoka wateyan levket
ji kêfa wê re bû Sazîn

Ji saza jîn duyem şînda
bedew xewnên me pêkanîn

Xelatên pir giran û pak
ji wan têr nabe qet nêrîn
Niyazên min bi nazdarî
dimînin taze û berşîn
Heta kû ew delalî hat
wekî navê xwe bû Şêrîn

# Hunermend

Erê dilnazikê dilyar
hunermendê herî dildar
Resen dengê te yê pîroz
vejîna coşe û damar
Tu bû wek bilbilê dilşad
li gel zembîlfiroş hevkar
Li şahyan û zemawendan
Civangermin hemî beşdar
Li rojên aram û germîn
lehingî her tu yî çekdar
Bi wî dengê zelel û zîz
girî û ken ziman û zar
Civata lê tu beşdarî
xweşî û şane amadar
Zimanzan î pevokbêj î
li dîroka xwe pir haydar

Evîndarê rewanpîroz

bijî dana dilê guldar

# Vedîtin

Çiyayên berze hêzdar in
dîrokdirêj in dengîn in
Vedîtin pir girêftar in
wekî sîper dişopînin
Ne wek eşqa me navdar in
ne wek hestên me zengîn in
Li hêlîna nehêndaran
tilûr in em du bangîn in
Li guldana evîndaran
kulîlk in em çi rengîn in
Em in dengê evîndaran
ji şahînê re m'çengîn in

# Vegerîn

Çima îro vegeryayî
bi peyvên wek gurîna çem
Dibêjî em gunehbar bûn
belê dîn û hejar bûn em
Bi yek carî me dest hildan
me dil daxda bi sêla rim
Bi lavlav û bi omîdan
tu jî wek min veşêrî xem
Ez ê canê te axoşim
nema êdî dikim kimkim
Nizanim çê bibêjim ez
serîşan im serîgumgum
Li ser çav û seran hatî
xwedî coş û bizavên germ
Ez ê çawa xwe hîn kim lo
li ser vê hatina bê dem
Di xewnên min de hişyar in

hemî çax û hemî serdem
Wekî ez buxçika gul bim
vexwartî bim sia zemzem
Lehengê xewneroan bî
bi dest bigrî xewa guldem
Dixapînî dilê bê dil
dibêjî va dikî dimdim

Tu hatî bê kû t'zanîbî
nema Zîn im tu nabî Mem

# Tebata geş

Dilê min got tuyê bêjî
li vir dil maye gel mêjî
Qelem rahêşte xemxakê
mebesta coşeyan rêjî
Tilûrên rastiyê firdan
derewxewn in dilo hêjî
Du çavan bo me vîn miştin
ji narînî bi denbêjî

Tebata bê ziman geş bû
bi geşbûna kenê hestan
Kirasê gulgulî reng da
hejand xiftan bi wan destan
Dema ew nameya lezgîn
hilav kir kakila qestan

Nema çav bang dikin hawar
zivistana me têrbaran
Bihara nû xemil danî
evînî bû siha daran
Zimanê dil pevokên nerm
belav kirbûn bi çar zaran

Guhê zîrek zumên sehkir
vehûna perdeya sazan
Hunermendan livandin can
bi helbestan bi awazan
Bila gur bin niyazên sar
bixwînin hinde daxwazan

Silava nameya lezgîn
Vejandin wan lemên baxan
Şilêr û nêrgizên bê can
xelat şandin ji bo saxan

Gulistanên herî serxweş

divîrînin serê saxan

# Eşqa Dînok

Nerîna pêşiyê vêket
silavan pêre ar geş kir
Yekem peyva te lerzok hat
hema bersiv xwe gurxweş kir
Mejî sêwan veda û çû
li gel dil wî damar piş kir
Hemî rayên piçûk û gir
bi biryara dil û hiş kir

Wiha lêhatina jînê
pevoka wateyan çê kir
Me nû zanî bi vî hawî
çira eşqa me dest pê kir
Çirûskên hezkirî der bûn
hemêza hêviyan fêr kir
Bi sewdayê hişê bê hiş
pilana rastiyê mê kir

Ji çîroka vejîna vîn
du rûpel jê re pêşkêş kir
Rewanê jîr qelem anî
du navên nû li wan rêş kir
Xeyalan bang dikir hestan
hinavên dîn cinav bêş kir
Erê eşqa me dînok bû
kela dînbûniyê pêş kir

# Jiyangêra nivîskar

Ew Narîna keça Omerê Seyfedînê Meylanî ye

Li bajarê Dêrikê ji dayik bûye

Bawernameya zankoyê bi dawî kiriye, "Beşê wêjeya Erebî", di kulîjeya Adab de.

Wê karê mamoteyiyê kiriye û di hemî

pêvajoyên fêrbûn û xwendinê de.

Sisê zarokên wê hene "Dastan, Sazîn, Şêrîn".

**Girûpên ew jê re dameznêr û yan jî ew endama damezrandê bû:**

Girûpa keçikên Dêrikê sala -1983 an.

Girûpa çandî û civakî ya keç û jinên Dêrikê.

komela jinên Dêrikê.

Girûpa Dêrikê ya çandî.

Baxê jinên Dêrika Hemko.

Tevna çand û hunera kurdî.

Girûpa mamosteyên zimanê Erebî. Hevbenda nivîskarên Dêrikê.

Yekîtiya mamosteyên Dêrikê.

Komela jinên kurd ya li Qamişlo hatibû damezrandin

Hevbenda "yekîtiya" nivîskar

û rojnamevanên kurd li Sûriyê.

Endama Encûmena niştimaniya kurdî li Sûriyê, Şaxê Dêrikê.

Ew yekem jina kurd e kû wê di sala 2012an de gazî li keç û jinên kurdan li Sûriyê kiriye ji bo avakirina "Hevgirtina jinên kurd li sûriyê" û bi wan re hevgirtin damezrandiye.

Xelat û bawernameyên wê wergirtine ev in:

-Xelata helbestvan Seydayê Tîrêj.

-Xelata rêxistina jinê di partiya "partî

dimuqratî kurdî li sûriyê, "alpartî".

-Xelata rêxistina jinê di partiya"Yekîtî

dîmoqratî kurdî li sûriyê.

-Xelata helbestvan û zimanzan Mela

Ehmedê Palo ji aliyê Yekîtiya nivîskar û rojnamevanên kurd li Sûriyê.

-Xelata rêxistina jinên Kurdistana sûriyê.

-Bawernameya tîpa muzîkê bi rêveberiya hunermend Ciwan Sebrî

Bawernameya baştirîn nivîser di sala 2009an de ji malpera "Diljan"

-Xelata sêyemîn ya çîrokê bi zimanê erebî ji aliyê diktora Xeldiye Al Xelîfe ve.

-Wêneyê Seydayê Cegerxwîn ji rêxistina Hesekê ya partiya Yekîtî.

-Xelata festîvala "mihrecana" helbesta kurdî ya 19 mîn li bajarê Qamişlo di sala 2014

an de.

-Navê wê di nav baştirîn nivîserên cîhanê de hate nîşankirin di sala 2009 an de.

-Xelata Seydayê Cegerxwîn ji aliyê komîta çandî ya partiya Pêşvero ve di sala 2017 an de li welatê Elmanya.

Du Xelata Rola Huseynat ya çîrokên kurt bi erebî di sala 2017 an û 2018 an de.

Xelata Rêxistana Aştî û Hevaltiyê li welatê Almanya 2019

Xelata Yekemîn ya Romana Erebî ji aliyê weşanxaneya "Dar elkelîmat" li welatê Elcezayir 2019

**Berhemên wê yên çapkirî ev in**:

" Hinga bêdengî can dikêşe, "حيث الصّمتُ يحتضر"helbest ji

weşanên çapxaneya dar azzeman

"Perîxana min" bi arîkariya saziya Semakurd hatiye çapkirin.

Romana "Çaxê derbideriya ber bi Rojava de" موسم النّزوح إلى الغرب"

Berhevok çîrokên kurt "Bûka rokê" ji aliyê çapxaneya "Dar Elxelîc" li Urdinê.

Romana "Axoşkirina Pênûsê ji demsalên giyan re" ji çapxaneya Elsukeriye li welatê Misrê.

Kenê şanya" helbest, ji weşanên Yekîtiya nivîskarên Kurdistana Sûriyê.

xelata yekemîn standiye di pêşbirka

Romana "Pistpistên bîrokê" bi zimanê erebî, çapxaneya "Dar elkelîmat" li welatê "Elcezayir" 2019.

**********************

# Helbest bi dawî nabin

# Naverok

Şîrava evînî û dilsoziyê ........................................ 2
Qelem........................................................................ 4
Xewna Şêx ............................................................... 5
Welatê Eşqê ............................................................. 7
Çemê Dicla ............................................................... 9
Sûnda Bêcan ............................................................ 11
Leyla Qasim.............................................................. 13
Piçûkanî ................................................................... 15
Xelata Kawa ............................................................ 17
Şeva Serserî ............................................................. 19
Zimanê Kurdî............................................................ 22
Avzêma Aferîn ........................................................ 25
Çavên Dil.................................................................. 27
Henasên Kobanî........................................................ 29
Pêlên Dilovan ........................................................... 31
Qedera Rojava .......................................................... 33
Feleknas.................................................................... 35
Jidilbûn ..................................................................... 36
Berf .......................................................................... 38

Jin Jiyan e ........................................................ 40
Ramanên Ciyawaz ............................................... 42
Yadê .................................................................. 44
Yabo .................................................................. 46
Rewşen Bedirxan ................................................ 47
Erê Kurdo ........................................................... 49
Amojgeha Lavan ................................................. 51
Xelatên Pîroz ...................................................... 53
Hunermend .......................................................... 55
Vedîtin ................................................................ 57
Vegerîn ............................................................... 58
Tebata geş .......................................................... 60
Eşqa Dînok ......................................................... 63
Jiyangêra nivîskar ............................................... 65